



Wênên li bergê: Muzexaniya Qerecedaxê

- 2** Bila sala nû ji bo me gîştika pîroz be!- **Ali Çiftçi**
- 6** Rapora 2006an ya Komîsyona YE: Naverok û encam - **Nebî Kesen**
- 8** Karacadağ'da müze - **Meme Xelîkan**
- 11** Konferansa parastin û perwerdeya zimanê kurdî li Diyarbekirê
- 16** Hîndekariya kurdî li Swêdê - **Ali Çiftçi**
- 21** Kilama Şêxê Hec Elî - **Nuh Ateş**
- 24** Qirana ermenî û ruman li Anatoliyê - **Dr. Mîkailî**
- 28** Em kurd tev mîna sêvên ji darekê ne! - **Kemal Topal**
- 36** Şîn û şewat - **Altun Başaran**
- 39** Bizim ailenin Alişanlı hikayasi - **Necatî Kanoğlu**
- 43** İçtoroslar'da Sinemilli Aşireti ve Komşuları - **Mehmet Bayrak**
- 55** Pir Sultan Abdal destanı - **Mem Xelikan**
- 60** Aksaray Kürt Ekecik Futbol Turnuvası 2006 - **Ömer Yüce**
- 65** Sohbetek bi **Ozan Şêxo re** - **İhsan Türkmen**
- 72** Şivan, mi ve berx kelimelerinin dilbilimsel-etimolojik tahlili - **Rafet Kılıçalp**
- 77** İlhan Kızılhan`dan bir kitap: "*Namus cinayetleri*" - **Nebi Kesen**

## Bila sala nû ji bo me gîştika pîroz be!

Bi sala 2007an em careka din bi hev re ne. Bi buyerên dîrokî yê rind û nerind, me salek din li pey xwe hişt û bi hêvî û daxwezên nû, ketin sala 2007an. Bila sala nû bo me gîştika pîroz be!

Îsal, rojên pîroz ên wek Noel, Îda Qurbanê û sersala Mîladî hemû ketin zik hev. Bi hev re hatin pîroz kirin. Armanca wan her sê rojên pîroz ev e; ku di wan rojan de meriv pirsê hev bike, hevûdu bibîne, ji merivên xizan û belangaz re destek be û alîkariya wan bike. Dilê biçûkan, malbat, cîran û merivên derûdora xwe şad û bextewar bike.

Hemû rojên pîroz ji kîjan bîr û baweriyê bin, bila bibin, armancên li jor hevbeş in. Mebesta pîrozbahiya van rojan ku ew nerindî, zordarî û bêdeletiya ku li rûyê dunê hene, bîn kêr kirin û mafê merivên xizan bîn parastin.

Gelo em van armancên pak ên pîroz, di pîrozkirinên niha de dibînin an na? Ew li gor merivek an dewletekê tîn guhartin. Hinek dikarin, bi serbilindî bêjin; erê, bo me ew roj rojên pîroz in û em ji bo mafên



merivên û edeletê kar dikin. Heta hinekên wek serokdewletê Tirkîyê, R. Tayyib Erdogan li ser navê dewletê dikare bêje; edeleta herî bilind li ba me ye. Ti problema me û xelkê din tuneye! Ew edelet ku bi hezaran zarokên kurdan li bajarên Kurdistanê û li metropolên Tirkîye, di temenên xwe yê herî biçûk de, ji sê saliyê bigrê heta deh-panzdeh salîyan, mecbûrî parsê û teşwêiqê suç dikin. Ew bêzar û bêziman, bêmal û bêxwendin, li serê rêyan hiştine!..

Mixabîn, ev armancên pak yê van rojên pîroz em dibînin, sal bi sal ji armanca xwe bi dûr dikevin di şûna wan armancên pak de pêşbirika(reqabeta) ezîtî û bazareka hîn pir malfirotinê çêdibe!..

Em hêvîdar in, ev rêçûnên ku niha rûdane, dê bîn guhartin û rojekê dawî lê bîn!

Xwendewanên hêja, di wê hejmarê de giraniya babetên nivîsan ziman, folklor û lêkolîn in.

Birêz, Nebî Kesen bi sernivîsa *Repora 2006an a komisyona YE: Naveroke û encam* repora YE a 2006an bi kurtî dide nasandin. Di raporê de xuya dike rêya endambûna Tirkiyê ya YE hê dûr û dirêj e. Herwiha daxwazên kurdan jî ji aliyê muzakereyan de ne zelal in. Birêz Kesen dide diyarkirin ku kurd jî hê bêkordînasyon û konsesûsekê ne.

Emekdarê kovarê, Mem Xelîkan bi sernivîsa *Karacadağ'da Müze*, muzexaneya şaredariya Qerecedaxê bi wêneyan dide nasandin. Di wê muzexaneyê de ji aletên cotkariyê bigrê hetanî cil û bergên kurdî yên kevn lê hatine berhevkirin.

Nuh Ateş ji folklorê Anatoliyê, *klama Şêxê Hec Elî*, Dr Mîkaîlî, bi sernivîsa *Qirana ermenî û ruma li Anatoliyê* makaleyek, nivîskarê, mêvan Kemal Tolan bi sernivîsa *Em kurd tev mîna sêvên ji darekê ne!* li ser eşeretên Anatoliyê lêkolye.

Necati Kanoğlu bi sernivîsa *Bizim Ailenin Alişanlı Hikayesi*, lêkolîneka bi zimanê tirkî û dîsan birêz Mehmet Bayrak, bi lêkolînên xwe yên balkêş ev hejmarê jî bo we, xwendewanên birêz dagirtine.

Bi hêvîya jiyaneke xweş!

**Ali Çiftçi**

## 20 zimanên mezinên ku îro bêtir di nav şeş hezar ziman de tên bi karanîn

*Li gor lêkolînên etnologan, dê ji nivê wan bêtir di dawiya vê sedsalê de wenda bibin!*

Ji hemû însanên ku li ser rûyê dunê dijîn, zêdeyî nivê wan, yek ji 20 zimanên mezin ên dunê dizanin. Di lista li jêr de erebî tune, ji ber ku erebiya ku îro tê dengkirin ji ya klasîka Qoranê cudatir e. Erebi li gor welatên ereban ku tê dengkirin lokalî ye. Erebiya lokalî ya mezin a Misirê ye. Ji aliye 44 mijon insanan ve tê deng kirin.

Ziman û hejmara dengkirin:

1. Mandarin (li Çînî) 874 mîlyon
2. Spanyolî 358 mîlyon
3. Îngîlîzî 341 mîlyon
4. Bengalî 207 mîlyon
5. Hîndî 185 mîlyon
6. Portegîzî 176 mîlyon
7. Rusî 167 mîlyon
8. Japonî 125 mîlyon
9. Almanî 100 mîlyon
10. Korî 78 mîlyon
11. Wu 77 mîlyon
12. Fransî 77 mîlyon
13. Javanî 74 mîlyon
14. Yue (Kantonêsî) 71 mîlyon
15. Telugî 69 mîlyon
16. Vîetnamî 68 mîlyon
17. Marathî 68 mîlyon
18. Tamilî 66 mîlyon
19. Tirkî 61 mîlyon
20. Urdî 60 mîlyon

Çavkanî: Ethnologue û ÖstenDahl.

## KOVARA BÎRNEBÛN Û GUMANA DADGÊR

Bîrnebûn kovara kurdên Anadolîya navîn e. Kurdên Konya û Anqarayê yên kurdperwer bi weşana vê kovarê pirs û pirsgirêkên xwe, dengê xwe digehînin raya giştî ya Tirkîyê û Kurdîstanê. Ji xwe kovar bi du zimanan, bi kurdî û tirkî derdikeve.

Kovar weşaneke lêkolînî, çandî û siyasî ye, organa tu rêxistineke nîn e. Di kovarê de bi giranî di derbarê kurdên Anadolîya Navîn û herweha di derheqê êl û eşîrên kurdan yê ku koçê Anadolîya Navîn kirine de lêkolînên hêja hatin weşandin.

Bîrnebûn li Swêdê ji aliyê weşanxana APECê ve tê weşandin û li seranserê Ewropayê û li Tirkîyê tê belavkirin. Li Anqarê dikanê pirtûkfiroş yê bi navê "Toplum Kîtapevî" û li Stenbolê li "Medya Kîtapevî" tê belavkirin. Xuyaye ku dewleta kemalîst a dagirker ji belavkirina kovara Bîrnebûnê aciz e, loma dadgêrê tirk bi guman li kovarê dinêre û herweke ku kovara organeke rêxistineka kurd ya îlegal be, di derbarê belavkerê kovarê yê Stenbolê de dest bi lêpîrsînê dike û îfadeyê xwediyê dikanê "Medya Kîtapevî" pirtûkfiroşê kurd, Selahattîn Bulut digre.

Sawciyê Beyoğlu yê Stenbolê celb dişîne pey Selhattîn Bulut ku îfadê wî bigre. Sawcî Nihat Erdem ferman dide

ku eger Selhattîn hetanî filan roj û filan saetî neyê qesra adliyê, ew ê wî bi zora polîs bînine wir. Selhattîn di wexta xwe de diçe wir. Dadgêr îfadeyê wî digre ku çima ew kovara Bîrnebûnê belav dike.

Selhattîn jî ji dadgêr re dibêje: "Ez xwediyê dikana Medyayê me. Kovara Bîrnebûn li derve çap dibe û ji Medyayê re ... ewqas tê. Bihayê kovarê jî ...ewqas e. Ji bo ku xwendevanên kovarê dizanin kovar ji dikanê min re tê, ew jî tînin ji dikanê dikirin. Bi qasê ku ez dizanim di kovarê de helbest, notên rêwîtiyê û bûyerên dîrokî tîne weşandin. Min bi tu şiklekî ji tu hepisxaneyek re kovarê neşiyandiye. Di derbarê vê de agahdariyên min ewqas in" dibêje û binê îfadeyê xwe îmze dike.

Li gorê ku Selahattîn ji min re got, yek yan diçe hepisxana Kahramanmaraşê û kovarê bi xwe re dibe yan jî bi postê kovarê dişîne wê hepisxaneyê Kahramanmaraşê û kovar tê girtin û herwekî ku kovara organa rêxistineke îlegal e, miemele tê kirin. Niha îfadeyê Selahattîn girtine û bi îhtîmaleke dê dadgêr wî bide dadgehê ji ber ku kovareke îlegal a rêxistinî belav dike.

Di navbera salên 1975 – 80 yî de li navçe û gundên derdora Konyayê rêxistina DDKD û OZGURLUK YOLU – Riya Azadî – bi hêz bûn.

Yanî piraniya xort û keçên ciwan yên derdora Konyayê yan Ozgurlikçî bûn yan jî DDKDyî. Min li bajarê Wanê mihendisekî bi navê Hasan Tuzcu nas kir. Hasan Ozgurlikçî bû û wî wê demê di derbarê kurdên Konyayê de gelek agahdarî dabû me. Hevaltî û dostaniya min û wî û herweha paşê jî bi gelek kurdên Konyayê re gelek baş bû.

Li Almanyayê min Muzaffer Ozgur û hinekên din, li Fransayê min Omer, Mustafa û hinek kurdên Konyayê yên din û li Swêdê jî min Hanefî Celeplî, Hesenê Alê, Alî Çiftçî û gelek kurdên Konyayê nas kirin û dostaniya me her domiya.

Ez jî kovara Bîrnebûnê re jî dil û can temeneke dirêj ê weşanê dixwazim. Ez hêvîdarim ew ê bi her awayî biserbikeve.

### Lokman Polat

Değerli dostlar,  
Bîrnebûn emekçileri,

Bu iletiyi ele almamın sebebi, şimdiye kadar vermiş olduğunuz emeklerin, bizleri ne kadar sevindirdiğini, ayrıca bizim kaybolan kültürümüzü bir nebze de olsa ölümsüzleştirdiğinizi, bizlere, yarınlarımıza bir kültür mirası bıraktığınızı, her geçen gün mirasımıza daha yeni

kazanımlar kazandırdığınızı, Orta Anadolu Kürtleri olarak sizlere minnet borcumuzun olduğunu, son yapmış olduğunuz cd. çalışması ile bizleri çok memnun ettiğinizi ve bu sevincimizi sizlerle bir nebze paylaşmak için kaleme aldım.

Satın aldığım elimdeki bu cd. çalışmanız, biz sılada yaşayan gurbetçileri daha gerilere götürecektir ve yaşanmış olan anıları, dert, keder, sevinç ve huzuru bir arada tekrar yaşama fırsatına nail edecektir. Bu vesile ile bizlere güzel eserler armağan etmiş, tıpkı Bîrnebûn dergisi gibi bizlere yeni bir kültür mirası bırakmış olan siz Bîrnebûn emekçilerine bizimde söyleyeceğimiz, muhakkak birşeyler olmalıdır.

Bundan sonraki çalışmalarınızda da sizlerin yanında olduğumuzu, sizleri sürekli destekleyeceğimizi, sizlerin yalnız olmadığını, bütün Orta Anadolu'daki ve diğer alanlardaki Kürtlerin de sizleri destekleyeceğini, Kürt kültür, sanat, basın kurum ve kuruluşlarının da destekte bulunacağını umuyorum. Daha nice yeni eserlerin kültürümüze kazandırmanız dileklerle, saygı ve sevgilerimle.

Kasım 2006, Den Haag/NL

Hayrettin ÖZDOĞAN  
Bîrnebûn okuru ve abonesi

## Rapora 2006an ya Komîsyona YE: Naverok û encam

NEBÎ KESEN

Komîsyona Yekitîya Ewropa “Rapora Pêşveçûn ya 2006an” ji bo Tirkîyê amade kir û di roja 8.11.2006 nişan da. Wek tê zanîn, Komîsyonê, ji sala 1998a vir de, her sal raporek li ser Tirkîyê amade dike. Lê, vê carê giraniya raporê li ser pêvajoyên danûstandinan (muzakereyan) bû. Berê û dawîya çapkirina raporê li Ewropa û Tirkîyê niqaşek li ser endametîya Tirkîyê dîsa destpêkir, çima ku hinek dewletên YE, wek Fransa, Yewnanîstan û Kibris di 8-9 beşên danûstandinan de rawestandî pêşniyar dikin. Rapora Komîsyonê jî, ji aliyê naverok û rexneyan ve vê daxwazê tesdîq dike. Berdevkên Komîsyonê jî êşkere kirin ku 8 beş divê bîna rawestandî. Di Civîna Mezin (Zîrve) ya Konseya YE de ev babet hat muzakere kirin. Bîrbara Kon-

seyê jî bi vî şiklî bû. Maneya wê ew e ku, prosesa danûstandinan dê giran bibe, û ew jî tesireke negatîv bide têkilîyên YE û Tirkîyê.

Îhtîlafa Kibris di vî bûyerê da rolek girîng lîst, çima ku Tirkîyê, gora protokolên hatine imzekirin, divê lîman û gumrikên xwe ji bo gemiyên Kibrisê veke. Komara Kibris dewletêke endamê YE ye û di biryarên Yekitîyê da xwedî maf e. Daxwaza Kibrisê ew e ku Tirkîyê şertên protokalan bîne cîh û wê dewletê wek dewletên din yê YE qabûl bike. Yewnanistan, Fransa û hinek dewletên din jî alîkariya Kibrisê dikin. Ji bona wê, pêşveçûna danûstandinan êdi bi sîyaset û pozîsyonên ewan dewlatan ve girêdayî ne.

Ji aliyê din ve sebeba biryara YE ne tenê îhtîlafa Kibrisê ye. Tirkîye ji sala 2004an vir de dest ji reformên

hiqûqî, îdarî, aborî û civakî berda û danûstandin bi pir kêmasî û astengîyan berdewam dikin. Rewşa Tirkîyê di du salên dawî de, ji aliyê maf û azadîyên mirovan de, rola ordiyê di siyaseta Tirkîyê da, mafên kêmetewan hwd., nêzikî kriterên endametîyê nebû. Pir daxwazên organên YE ji bo reformên nêzîkbûnê (entegrasyonê) yan nayên berçavkirin yan jî bi gavên giran pêktên. Hikûmeta AKP ji tîrsa ordiyê û hêzên din, ku dijî YE ne, nikarê prosesa reforman berdewam ke. Di salekê da ji 429 qanûnên ku ji bo danûstandinan pêwîst in, tenê 148 qanûn heya niha ji aliyê parlamentoya Tirkîyê ve hatine qebûl kirin. Loma, prosesa danûstandinan giran pêşve diçe û di nav YE de rexne digre.

Di rapora 2006an ya komîsyonê de sîstema Tirkîyê ya hiqûqî, aborî, siyasî û civakî carek din tê analîz kirin. Rapor, wek salên berê kêmasî û astengîyan di warê danûstandinan da tîne ziman. Yek ji wan babetan jî pirsgerêka kurd e. Lê komîsyonê careke din ev pirs bi mafên mirovan û çandî ve giredaye û şirove kirîye. Bi gotinek din, xuya bû ku komîs-

yon hîn jî ji qebûlkirina pirsgerêka kurd dûr e. Di raporê de pîrsa zîmanê kurdî, rewşa aborî û civakî li bajarên Kurdistanê bi pîranî hatiye zîman.

Ji bo Tirkîyê rawestandina hinêk beşên muzakereyan de di rêya endametîya helwesteke nû pêkanî. Bi vî awayî mimkûn e ku Tirkîyê hin 20-30 salên din di prosesa berendametîyê de bimîne û ji armanca endametîyê dûr bikeve. Ji bona vê, pêwîst e ku Tirkîyê şertên YE bi reform û gavên nû bi lez pêk bîne.

Tevgera kurd, divê paşveçûyîna tîkîliyên dualî û rawestandina muzakereyan baş fêm bike û li gora wê siyaseta xwe tespît bike. Guhertînen Tirkîyê di warê berendametîya YE de, ji bo civata kurd û rêvekirina çareserkirina pirsgerêka kurd pir girîng in û divê bîr berdewam kirin. Partî, rêxistin, dezgeh û şexsiyetên kurd hîn jî bêkonsepteka netewî ne. Grubek kordîasyonê û konsesûsek netewî tune. Daxwazên kurdan ji aliyê 35 beşên muzakereyan ne eşkere ne. Bi vî awayî jî kurd nikarin rola xwe bilîzin û berjewendîyên xwe bidin qebûl kirin.

## KARACADAĞ'DA MÜZE

### MEM XELÎKAN



**Karacadağ Belediyesi, 05.02.2002 tarih ve 08'nolu kararı ile, Toplum Eğitimi ve Kültür Merkezi kurulmasına karar vermişti.**

Belediye; bu kararını müteakip, şehir merkezinde bulunan atıl durumdaki eski ilkokul binasının kullanım hakkını MEB'ndan alıp, binanın imar ile ilgili sorunlarını da çözerek binayı belediye malı haline dönüştürmüştü. Atıl durumdaki ve yıkılmaya yüz tutmuş adı geçen bina; Hollanda Hükümeti bünyesinde faaliyet gösteren NCDO adlı, yatırımcı kuruluş ile işbirliği yapılarak, inşaat maliyeti-

nin % 50'sini adı geçen kuruluş, % 50'sini de belediye olanakları ve gönüllü kişilerden temin ederek, bina amacına uygun hale getirilmişti.

### **Projelerin amaçları;**

- Kasabalarında yaşayan insanlarına okuma alışkanlığı kazandırmak.
- Kültür merkezine yerleştirecekleri bilgisayarlarla dünya ile iletişim ağı kurmak.
- Dil kursları düzenlemek
- Düzenleyecekleri etkinliklerle (folklor, saz kursu, resim -tiyatro çalışmaları, ses yarışması vs.)





- Halı, kilim tezgahları kurarak, insanlarını meslek sahibi yapmak.
  - Orta ve yüksek öğrenim gören öğrencilerin, gelişme ve hayata hazırlanmalarında kurslar açarak yardımcı olmak ve yol göstermek.
  - Düzenli aralıklarla, çeşitli konularda konferans, paneller düzenleyerek kültürel etkinliklerde bulunmak.
- Şeklinde dile getiren, belediye yetkilileri; bu güne kadar, Kültür Merkezi bünyesinde;
1. Kütüphane açtıklarını,
  2. Satranç ve bilardo yarışmaları düzenlediklerini,
  3. 10 adet bilgisayar hizmete sokarak, bilgisayar ve saz kursu düzenleyerek, katılanlara sertifikalarını verdiklerini,
  4. Hafta sonlarında ücretsiz, üniversite kursları düzenlediklerini,

23 Temmuz 2006 tarihinde, ilk defa gençliğin çabaları ile, 1. Karacadağ Şenliğinin düzenlendiğini dile getirdiler. İlk olmasına rağmen bu şenlik olumlu eleştiriler aldı.

Asıl önemlisi de; bölgede ilk defa, bu kasabamızda açılan müzedir. Başta belediye, gençlik ve Karacadağ halkının duyarlı insanları, Kültür merkezi bünyesinde; müze olarak ayrılan bir odaya, ellerindeki antik sayılabilecek giysi, kap - kacak, tarım ve zirai aletlerini bağışlamışlar. Birde; müze olarak ayrılan odaya, kasabanın rahmetlik olmuş büyüklerine ayrılmış olan köşe ayrı bir güzellik katmış. Bu büyüklerimizin, fotoğraflarının bu köşede sergilenip orada insanlarımızın, gençlerimizin hizmetine sunulması bana çok anlamlı geldi.



Kültür Merkezi yöneticilerinin, halka ellerinde bulunan bu tür antik değerdeki, değerleri müzeye bağışlamaları ve bunların burada koruma altına alınması çağrısını da hatırlatarak; Hizmeti geçmiş arka-

daşları candan kutluyor ileriki çalışmalarını için başarılar diliyorum. Ayrıca bu haber için fotoğrafların çekimini yapan *Cem Celep*'e teşekkür ederim.

### **Pêşbirika çêrok**

Xwendevan û heweskarên  
qedirbilind!  
Bibaxşînin!

Ji ber hinek sedeman, berî  
gîştkan jî yên teknîkî diyarkirin  
û êlankirina encamên pêşbirika  
kurteçîrokên kurdên Anatolîyê  
bi derengî ket. Em ê di demeke  
kurt da we hayadar bikin.



# Konferansa parastin û perwerdeya zimanê kurdî li Diyarbekirê

*"Li her derê zimanê kurdî bi kar bînin!"*

Konferansa Parastin û Perwerdeya Zimanê Kurdî ku di çarçoveya 4'ê mîna Rojên Wêjeyê li Diyarbekirê di navbera 18 û 19'ê meha 11an de bi beşdariya 150 nûneran, li salona konferansê ya Şaredariya Baxlarê pek hat. Şaredarê Bajare Mezîna Amedê Osman Baydemîrê gotara xwe ya vekirina konferansê, destpekê kir. Birêz Baydemîr, di axaftina xwe de got; ku li ser çand û zimanê kurdî gelek astengî hene. Baydemîr, destnîşan kir ku astengiya herî mezin ne bikaranîna ziman a di jiyana rojane de ye û wiha got: *"Em di jiyana rojane de vî zimanê bi kar bînin. Ez bawerim ev gav pêk werin, her çiqasî di warê qanûnî de jî, di warê hiqûqî de jî ev astengî hebin, zexmetî jî hebin, dem bi dem, roj bi roj mafên çandî, ziman û bikaranîna ziman dê pêş bikeve."*



Foto: Azadiya Welat

Encamname li ser navê delegeyên konferansê, bi kurdî ji aliya Alî Çiftçi û bi tirkî jî ji aliya Samî Tan ve hate xwendin. Di konferansê de li ser rewşa kurdî, asîmîlebûyîn, xweasîmîlekirin, otosansûrî û li ser parastin û perwerdeya zimanê kurdî, gotûbêjên dirêj hatine kirin.

Di encamnameya *Konferansa Parastin û Perwerdeya Zimanê Kurdî* de bang li hemû rêxistinên kurdan ên siyasî û yê civakî, hate kirin û wiha hate gotin: *"Tiştê girîng ev e ku beriya her tiştî di jiyana rojane de, di danûstandinên bi her awayî de zimanê xwe bi kar bînin. Di vî warî de kêmasiyek heye, berî her tiştî divê ev kêmasî ji holê rabe"*.

## Hamit Ateş (1947-2006)

çû ser heqîya xwe.

Hamit Ateş di kovara Bîrnebûnê de bi navê Mem û Hem yaranî û henek dinivisî.

Hevalekî ji alîye huner û çandî de xwediyê gotinên dewlemend bû.

Bila rehma Xwedê lê be.

Yên mayîn re em sebireka mezin û serxwaşiyê dixwazin!



## ÇÎMA

Ji mamoste Hemîd re

*Dû te ve  
qulingan wana asîmanan  
per şikestî terk kirin  
hêvîyên min di baskên xwe de  
hêlandin û wenda kirin*

*bêje te çi kir  
dilê te li kê şikest  
çîma te dost û heval  
çav bi girî  
keç û bûkên me şara sêrî xelî  
em sêwî kirin*

*te nizanî ew çavên te  
yên bi per  
kîjan dest û pê yên şikestî  
xwelî yê bavên ser!*

MEM XELÎKAN

**Hemîd Ateş** di sala 1975a ji bo xwe kuştinê (intihar) xwe bi xwe qurşûn kir û çavên xwe wendakirin. Li wê demê, li wê qezayê dayîka wî (Fata Hecî Hemê û bixaltî ya wî, Eşa Erew (Dayîka min) li ser wî kilam çekiri bûn.) Ez dixwazim, jiyana wî hate nivisandin tu kêmasî nebin. Ji bo wê yêkê; ew kilaman li dawîyê ji te re dinivîsîme. Te xwastî yê wana jî, ji bo nivisa hûn li ser Kek Hemîd binivîsin bi cîh bike. Lê min nikarî kîjan dayîka wî û kîjan jî dayîka min gotine, ji hev vedim. Dîsa jî li gotina, ew xwe aşîkar dikine.



**Mem Xelîkan**

## MAMOSTE HEMÎD

Bejna Hemîdî min şîva ter e  
Bi ser Altilera şewitî da werdigere  
Mircê min qurban gavên junî ya  
Melîhe qurban çavên bi per e

Çavên çend in çavên çend in  
Bruyên di sera li govend in  
Pênc lawikên min din hene  
Li herdê Hemîdî min îzbend in

Hemîdî min mêrekî ji mêra zêde  
Qawe vekirî yê texsî yê li ber e  
Tu muelîm î, te bi pê de  
Toxtira çare nedîn daka çavên xwe pê de  
Hat gulgulî hat gulgulî  
Yaxa spî li stu fetilî  
Hemîdî min siweda serê xwe kurkir  
Bexê li nênika xwe nefikirî

Serî Hemîdî min çi bi saz e  
Bi diyarê Kanîya Jêri ketim  
Nizanim dengê qulinga bû, nizanim qaz e  
Hemîdî min raketiye xwînê sur e enîyê beyaz e

Hemîdî min mêrê merd e  
Çûm dîyarê Kanîya Jêri ketim  
Pardosi texsîyê da elbîsê li herd e  
Rê bidin daka kûrbûyî çavên bi bîrinên  
Destê xwe bi ser de

Fato bê min Hemîdê xwe vi rê kiro  
Li ber edlîyê teslîme cenderma kiro  
Ser sendelyê rûnişt heqê xwe bi xwe  
Li qarşî hêkîm midafe kiro

Mala minê ji mala wê da  
Tê dengê koza min gal û gur tê da  
Bihata malê dinê malî Hesê gî pê da  
Bihata ço û cêmerîyê Mistefa yî Hecî yê bida

Aksaray bişewite ê li hemper e  
Î Mihelîm e navî mehkûma medin ser e  
Bixaltîyê min mehkûm kirin  
Cenderma xwe bi sîleha dane ber e

Bixaltî min him muelîm him şofer e  
Li hatina biharê rêçber e  
Kes bi zanîne nare ser e  
Elî Zêwikê yî ewûkat nare di ber e

Ji mektebê tê çingî rind e bi rê çûyîne  
Piyên dirêj li babûne  
Salîh tu çûyî Alemên wi Nuh û Hesên re bê  
Min îzîna xwe derbas kir li Enqerê ber Nûmûnê

**Mem Xelîkan** (Berhevkar)



## Baba ve kızı aynı zaman da ödül sahibi oldular!

Avrupa'da yaşayan ve Türkçe yazan şairlerin 124 eserle katıldığı 3. Avrupa şiir yarışmasının birincisi, yarışmaya İsveç'ten katılan Hamdi Özyurt'un 'İNSAN GÖZLERİNDEDİR' şiiri oldu.

Aynı zaman da ilkokul üçüncü sınıfına giden kızı, Helina Özyurt da okullararsı öykü yarışmasında yılın "Küçük Nobel Ödülü" sahibi oldu.

Hamdi Özyurt Kuzey Kurdistanlıdır. 1989'dan itibaren İsveç'in Gotland adasında yaşıyor.

Özyurt şimdiye kadar 16 eser vermiştir. Bunların içinde çocuk kitapları, öykü, şiir ve roman türleri vardır. Bu 16 kitaptan beşi romandır.



### İNSAN GÖZLERİNDEDİR

ormanın üvey ağacıym ben  
yapraklar sarardıkça anımsa beni  
ruhu yongasında, kırılan dallarında  
yüzgeçsiz balık, kanatsız kuş say beni  
leylaksız haziran, düşsüz insan say  
gülüşüm bir kahkahadan ödünç  
köküm ısladığı toprakta kuruyacak  
nabzımı bul, elini alınma koy  
ateşim bende fazla burda kalacak

sular ılıdıkça müslüman bir ölüyüm  
kazanlar ısındıkça anımsa beni  
tenimde üşüyen sabun, unutkan köpük  
gözlerin yağsun beni, iki şiir damlası  
kendinden sürmeli gözlerin, şair yavrusu  
insan bir defa doğar, birkaç kez ölür  
bu seferki son yolculuk, temelli gidiş  
ha teneşirde kıy adıma, ha musallada  
ne fark eder, aynıdır her terkediliş

eşyama sat, imamı sav, sal müminleri  
günahlar döküldükçe anımsa beni  
işte son noktasıyla en yalancı hakikat  
bir susamdan karanlığa açılan kapı gibi  
aynı uzaklıkta artık gurbet ile memleket  
illa ki üzüdür az ya da çok her insan  
oysa ölüm değil, beter olan unutulmak  
eski kadınlar gibi aklında taşı beni  
yoksa bana müthiş yazık olacak

unu sır, buğdayı sır, taşı efsane  
ıssız değirmenlerle anımsa beni  
az çevrilmedik nakaratında suyun  
bizi birbirimize aşk itti, aşk bağladı  
paylaşacak şeyleri kendimiz kaybettik  
hadi çat kaşlarını kalem kırar gibi  
ağla, ağlamak iyi gelir  
yaş düşmese sen düşersin  
çünkü insan gözlerindedir

Hamdi Özyurt

# Hîndekariya kurdî li Swêdê<sup>(\*)</sup>

Ali Çiftçi

*"Ew kesê ku bi zimanê xwe hîndekariyê nebîne, di destpêkê de zehmetiyên mezin dibîne.*

*Fêrbûn/hîndekarîya zanistî ku bi zimanekî ku meriv hê baş fêm nake, dem û karê meriv dubare û sêbare dike!"*

(Ladberg 2000:156)

*"Dema zarokek gotinekê bi zimanê dayika xwe dizanê, dikare bi hêsanî wê gotinê bi zimanê nû fêr bibe."*

(heman çavkanî 2000:181)

**Hîndekariya kurdî li Swêdê bi dîroka perwerdeya zimanê malê/dayîkê ve destpêdike.**

**Dîroka perwerdeya bi zimanê dayîkê li Swêdê dereng destpêkiriye. Dema em li programa perwerdê ya Swêdê dinêrin, cara pêşî di programa perwerdê ya Lgr 80î (mufredatê ya Swêdê ya sala 1980) de bi navê zimanê malê(*hemspråk*) lê rast tên. Berî vê di programa Lgr 69an(mufretadata-1969an) de tenê kurseka bi zimanê finî dibînin.**

Li gor Lgr 69an di heftê de du saet, di şûna dersek din de ev per-

werdeya tenê bi zimanê finî hebû. Heta sala 1975an li Swêdê dîtineka ku xerib li nav civata Swêdê de bîn asîmîlekirin hakîm bû.

Piştî lêkolîn û encamên perwerdeya asîmîlekirinê, di piranîya raporandê hat diyarkirin ku ev di alîyê perwerdê de ne serkeftî bû. Bilakis ji bo fêrbûna zimanê serdest astengî derdixist pêş.

Bi biryara parlamentoyê ya 1975 an de, fermî perwerdeya bi zimanê dayîkê hat qebûl kirin.

Bi vê polîtîka nû, xerib di gelek katên civakî de bûn xwedî mafên wek azadiya hîlbijartinê, wekhevî, xwedî berpirsyarî û mafên demokratîk û

\* Ew gotar di konferansa parastin û perwerdeya zimanê kurdî, di 18-19 /11/2006an de, li Diyarbekirê hatibû pêşkeş kirin.



kesayetî, wek hemwelatiyên Swêde.

Bi vê biryara fermî ya meclisê, di sala 1977an de reforma hîndekariya zimanê malê destpêkir. Li gor vê reformê, mafê her zarokekî, di heftê de du saeta hîndekariya zimanê xwe yê malê bibe û heger hewce bike du saeta jî bi zimanê xwe yê malê alîkariya dersên din bigrê heye. Ev maf jî her li ser daxwzeka azad e. Lê ne mecbûr e. Yanî bi daxwaza dê û bav ve girêdayî ye, heger dê û bav nexwazin, zarok naçin dersa zimanê malê.

Heta sala 1997an ev reforma fermî bi navê hîndekariya zimanê malê hatibû qebûl kirin. 1997an de di şûna zimanê malê, gotina zimanê dayîkê wek fermî hat nav kirin. Sebeba vê jî ev bû ku bi lêvkirina zimanê malê, ji bo kesayetiya zarok tu tiştêk îfade nedikir. Ji ber wê ev guhertin kirin, perwerda zimanê dayîkê (*modersmålsundervisning*).

Ew reform li Swêde, bi qanûnî dikeve berpirsiyarîya hemû şaredariyan. Şaredarî ji bo belavkirina agahdariya vî mafî berpirs e. Ji bo peydakirina mamosta, kitêbên perwerdê û peydakirina hemû îmkanan berpirs e.

Bi vê reforma hîndekariya bi zimanê malê re, di pîla universitê de, di dibistana bilind a mamosteyan de, beşa mamosteyên bi zimanên malê

(*Hemspråkslärarlinje*) hat vekirin. Di destpêkê de ji bo deh zimanên mezin, beş hatin vekirin. Di nav van deh grubên xerib de beşa zimanê kurdî jî hat vekirin. Beşa zimanê kurdî 1985 heta 1995an berdewam kir.

Hîndekariya zimanê kurdî li Swêde jî bi vê prosesa li jor destpêkir. Yanê bi mafên ku ji bo xeriban ji teref dewlêta Swêde ve hatibûn dayîn, kurdan jî jê feyde dîtin. Bi taybetî jî kurdên ji Bakur û Başûr hatibûn, bi aktîvî ev maf bi karanîn.

1980î bi desthilatdariya eskeriya Tirkîyê ve piraniya kurdên politîk ên Bakûrê welêt derketibûn derveyî welêt. Piraniya wan hatibûn li Swêde bi cîh û war bûbûn.

Ev kurdên polîtîk di destpêka 1980î de li Swêde, di warê rêxistinî û hîndekariya zimanê kurdî de aktîv bûn. Bi dehan komelên sîyasî û çandî hatin damezrandin, dîsan bi dehan weşanxanên kurdî hatin avakirin.

Federesyona komelên kurdan hat damezrandin. Bi vê wesilê kurdên Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojava û yê ji Anatoliya Navîn hatin ba hev. Bi hev re, di karên polîtîk û çandî de kar kirin. Her bi zimanê kurdî bi hev re deng kirin. Ew hemû bû wesileyek ku hêdî kurd, li Swêde bi kurdan re radibûn û rûdiniştin!...

Ev têkilbûn û hevkarîyên hem-

welatî bûn sebeb ku kurdên Swêdê bi her awahî xwedî li kesayetî û zimanê xwe derketin. Bi rêxistinî bûn. Ew hemû bûn sebeb ku mafên hebûn karibûn bi rihetî, bi kar bin. Hêdî zimanê kurdî jî li Swêdê wek zimanên din bûbû xwedî statuyek û mafek ku karibû pê jiyana xwe bidomîne. Bi sedan mamoste, tercûman û karmendên şaredariyan ku kurdî dizanin, bûn xwedî kar.

Rojname û kovarên mehane, pirtûkên perwerdê û yên zarokan, bi taybetî jî ji destpêka 1980 î heta 2000î bi awakî aktîv hatin weşandin.

Ew hemû ji bo perwerdeya zimanê kurdî bûn alîkar û rê ji bo pêşxistin û parastina zimanê kurdi vekirin.

YE (EU) ji bo parastin û pêşxistina pirzimanî û pirçandî, di dawî de gelek program dan ber xwe. Parastin û pêşxistina pirçandî û pirzimanî yek ji prensipên welatên YE ye. Ji ber wê yekê jî li welatê Ewropa di wan salên dawî de gelek lêkolîn û rapor têne kirin.

Bi kurtî piraniya raporên ku hatine belav kirin, ji bo parastin û pêşxistina zimanê dayîkê, di van herdu xalên jêr de hemfikirin in.

**1. Zimanê pêşiyê ji bo kesayetiyê xwediyê roleke mezin e.**

**2. Ji bo fêrbûna zimanê dûdû û sêsiyan bigeheke hêzdar datîne.**

Li gor van presipên YE divê hersal di dibistanan de statîstîkên perwerda zimanê dayîkê bîn kirin.

Li gor wan statîstîkan li Swêdê statîstîkên perwerda kurdî bi giştî bo sala 2004an weha ne:

Li Swêdê, ji pola **yekê** heta ya **neha** 9 046 zarokên kurd ku mafdar in, beşdarî perwerdeya kurdî bibin, hene. Ji wan 5 745 beşdarî perwerdeya kurdî dibin. Ev wek rêjeyek ji %64 e. Hejmara zarokên pêşdibistanan, lîse û şagirdên ku beşdarî perwerdeya bi kurdî ango perwerdeya alîkariyê dibin, ne di nav vê hejmarê de ye.

Eger meriv wan jî bihesibîne, hejmara zarok û ciwanên kurd yên ku li Swêdê beşdarî perwerdeya kurdî dibin di ser heşt hezarî re ne.

Li Swêdê 143 665 şagirdên ku bi 157 ziman û zaraveyên cihê dipeyivin û mafê wan yê beşdarbûna zimanê zikmakî bibin hene. Ji wan %54,77, ango 78699 beşdarî perwerdeya zimanê zikmakî dibin.

Îstatîstîkên perwerdê, Dayreya Karûbarên Îstatîstîkan (SCB), amade dike. Her sal di dawiya meha 10an de her mamoste bi awayê pirsînê, ji şagirdên xwe dipirse, ka li malê bi kîjan zimanî dipeyivin. Her dibistan li gor beyanên mamosteyan formên îstatîstîkan tijî dike û ji SCBê re dişîne.

Li gor îstatîstîkên ku di meha 10an ya sala 2004ê de hatine amadekirin hejmara şagirdên kurd: (tablo 1)

zarave	xwedîmaf*	beşdar	rêjeya beşdaran
kurmancî	5181	2894	%55,3
soranî	3865	2881	%74,54
hemû	9046	5745	%63,5

\***Xwedîmaf:** Li gor qanûna perwerdeyê, zarokên ku di mala xwe de, yan bi dê yan bi bav yan jî bi herduyan re, bêyî swêdî bi zimanekî din diaxifin, mafdar in ku beşdarî perwerdeya zimanê zikmakî bibin.

Hejmar û rêjeya keç û kuran: (tablo 2)

kurmancî	xwedîmaf*	beşdar	rêjeya beşdaran
keç	2398	1424	% 59,4
kur	2783	1470	% 52,8

Wek ji van hejmaran jî diyar dibe, rêjeya keçên kurmanciaxêf yê ku beşdarî perwerdeya kurdî dibin ji ya lawan bilintir e. Ango meyla keçan pirtir li ser xwendina kurdî ye.

Li gor îstatîstîkên van heşt salên dawî, hejmara şagirdên kurd yê kurmanciaxêf: (tablo 3)

Sal	xwedîmaf	beşdar	rêjeya beşdaran
1997	3441	1827	% 53,2
1998	3904	2189	% 56,0
1999	3864	2013	% 52,0
2000	4330	2211	% 51,0
2001	4507	2271	% 50,3
2002	4832	2559	%52,9
2003	5111	2702	% 52,8
2004	5181	2894	% 55,8

Di van heşt salên dawî de, rêjeya zarokên kurd yê ku beşdarî perwerdeya kurdî dibin her tim li ser ji %50î re ye. Rêjeya nizmtir ya sala 2000î û ya bilintir jî ya sala 1998 û 2004ê ye. Sedemên vê yekê em nizanin, lê rastîyek heye ku di van salên dawî de meyla rêjeya yê beşdar ber bi bilindbûnê ve

ye. Lê divê ku kurd jî vê yekê bizanibin ku ev rewşa li Swêdê dikare weha berdewam neke. Nimûneya finîyan li ber çavan e (*Li tabloya 5ê binêre*). Her ku diçe di vê civatê de dihelin. Loma êdî ew daxwaza zimanê dayikê kêm dibe.

Di van heşt salên dawî de, hejmara şagirdên ku di pola nehan de kurdî xwendine û dibistan qedandine: (tablo 4)

sal	kurmacî	soranî	hemû
1987	150	41	191
1988	173	61	234
1999	176	115	291
2000	192	147	339
2001	199	162	361
2002	192	192	384
2003	228	235	463
2004	290	273	563
tevî	1600	1226	2826

Kurdî li Swêdê di nav 10 zimanên mezin de ye; ku mirov hejmar û rêjeya çend zimanên ku di nav 10 zimanên mezin de ne bide ber hev, tabloyeke weha derdikeve holê:

Hejmar û rêjeya beşdarbûnê ya perwerdeya zimanê zikmakî ya çend zimanên mezin: (tablo 5)

ziman	xwedîmaf	beşdar	rêjeya beşdaran
erebî	24053	16014	% 67
farisî	6573	4182	% 64
finî	9922	4111	% 41
îspanyolî	10074	5373	% 53
kurdî	9046	5745	% 64
tirkî	5187	3044	% 59
îngilîzî	7250	3556	% 49

**Çavkanîya îstatîstîkan:**

SCB (Dayreya îstatîstîkan ya navendî ya Swêdê)

Ji malpera dibistana kurdî hatiye wergirtin.

## KILAMA ŞÊXÊ HEC ELÎ

Min pir cara bihîstiyê, wer tê gotin, ji Xelika pir meriv li Çelenqelê (Çanakkale) şehîd ketine. Hinekê qala 50 şehîdî dikine. Hingê Xelika 50 mal bûye. Li gorê vê, her malekê şehîdek daye. Va hêjmar ra çiqas rast e nizan im. Min li ser vê mijarê lêkolinên kûr nekiriye, lê wexta ku min ji çend kesan pirsî, wana tenê navê neh-deh şehîdan heldan. Deh kes jî ne hindik in, serî deh malan şehîdek.

Meriv dibihîze ku ji gundên din ên kurd li nava Anatolîyê pir kes li herba Çelenqelê şehîd ketine û gazî bûne. Va jî bi me dinimîne ku di her bostek erdê Tirkîyê da keda (emeg) kurda heye. Wana sewa xelasî û parêztina coxrafya Tirkîyê jî canfêdatîyeke mezinê kirine. Lewma, nabe ku kurdên Anatolîyê xwe li Anatolîyê wekî mihecîr û mivan bibînin yan jî weng warin niman-dine.

Anatolî ji berê da jî cîh û warê ejdadên Kurda bûye. Pêşiyên kurdan Meda, Horya û Zelanîyan li Anatolîyê, Pontus û Kapadokîyê bi hezaran sala berî vê hukumdarî kirine. Mîrîtiya Germîyanên Kurd jî li roja

vaya Anatolîyê hefsed–heştred sal berê hukum ajotîyê. Anatolîya milkê Kurda ye jî.

Çi heyf e ku piraniya Kurdên Anatolîyê jî ji zanîna dirokî bêpar maye. Ew ji bo xwenasîn û kesatîyê ferz e. Kêmanîyeke mezin e ku ronakbîrên kurdên Anatolîyê heta niha li tarîxa xwe ya cîwarî û bûyerên gundê xwe yê tarîxî negerine û li ser wana hayadarî berehev nekirine û nenivistine. Şehîdên herba Çelenqelê ji yek ji wan bûyerana ye.

Şêxê Hec Elî ji Xelika ye (Karacadağ/Kulu/Konya) û li herba Çelenqelê şehîd ketiye. Xwangê, Eşa Hec Elî kilamek li ser wî straye. Birayê min ê rehmetî, Hemîd zû va ye ku çend kilam ji devî Fata Îsmê (Behzatoglu) a rehmetî helnabû ser şêritê (Qeset). Yek ji wana kilama Şêxê Hec Elî bû. Min ji ew li gorê ku min jî qasetê fehm kiriye nivisî. Çend rêz min fehm nekirin û şûna wana bi nixtan nişan kiriyê. Malava be, Mem Xelikan jî alkarî kir û çar çarînen dawîyê ji devî Hûçê Ummê (Çankaya) wergirt û ji min ra şand.

**NUH ATEŞ**

## ŞÊXÊ HEC ELÎ

Şêxko Şêxko hucume Çelenqelê kirin cake  
Şêxko te go, em ê bi ber îstirhacê ketine, ma sulhê rica kin  
ez heta siwe da nav cîyê xwe da rûniştim,  
li ber Xwedê digerîyam mi digo, Ella Ella  
sewê xatirî Fatikê Memed şehîdê Çelenqelê gîştka rake

xwangê nawêm berê, nawêm ne jî paşê  
hûn ê li mala xwe rûniştine,  
ez ê niha ditirsime ji mala bavê xwe ji telaşê  
bi salixdanê Heci malê Bêrê, Silî Kerro  
birina telê bi tenê di çatî henî ra, li qaşê

weng e weng e Şêxko weng e  
qaçaxê çîyayê Çelenqelê dane ber xwe gaz û ben e  
Va tirsî, xwang kwîr biwe ê bi tirs e  
Kafirê kafir tirsî le min ê pêle we ne

.....  
Ro vi roya ra, ro vi roya ra  
Dangîyê bavî min qerbelixe  
Berx û kavir çûn vi mîya ra

Salixdanê Heci malê Bêrê, Silî Kerro  
Birina telê bi tenê li çatîya henî, di ser birûya ra  
Ûsivko tu yî li Semûlê li pêr î  
Şêxko Şêxko tu li Çelenqelê li nav şêr î

li hêla malê Milosmên vi pêşiyê ketim  
lo lo mı go, vî qiranî le cî tîlî, ku va terî  
got xwangê ji pêş min here,

ez li nav çex bûm, î temem e, gî venêrî  
.....

Dilê min tike tike  
Tenak bîrine hendik e  
heyşt xwangê vekin  
Ka lawik e ka keçik e

Dilê min kula li bin zimên no  
şevqê da li Çelenqelê da goristên no  
Bûkê mala bavî min sêvi cihîştin  
Huro xalan hatin satî nate ser qirên no  
Min go heynin berin Çelenqelê her da xwedin no

Dilê min lake lake  
Kes ji felekê tu avilê nake  
Brayê heyşt xwanga li Çelenqelê maye  
Lo lo were xwang kwîr biwin ê hey telake

Ji vê hengorê heta wê hengorê  
Raneketim ji dengê dergûşê ji lore lorê  
Lo lo telê bi tenê li wir maye  
Malneket kafira ji dest min girt bi zorê.

# QIRANA ERMENÎ Û RUMAN LI ANATOLIYÊ

DR MÎKAÎLÎ

Mesela qirana ermenîya pir aktuel e, di rojevê da ye. Ji boyî vê min xwest informasyonên ku min heta nika di hin deran da xwendî bûn û ji mezinên me, kal û pîrên xwe bi-hîstî bûn, bi xwendewanên Birne-bûnê va parve kim.

Ji ber ku li dû şera yunan û tirk gundî me ji hêla yunanîya da hatîye şevitandin, mala kalî min çûyi, li Heymanê bi cî bûye. Dîya min wêngê hîn gelek çûk bûye. Wê tim qala cîranên rum dikir û pir kêfa xwe pê dihat.

Ji wa bîranîna yek ew bû;

*Dîya min a rehmetî digot; Cîranê me ye rum ji min pir hezdikirine û tim dihatine malê bavî min û ez bi xwe ra dibirime mala xwe û bi min şa dibûni.*

*Dîya min ji vê ditirsîyayi û ji bavî min ra digotiyî; Heysif va gawirana tu zirarikê nedin keçika me?*

*Bavî min, ku bixe pir dîndar bû, bi gotina wê dîkenîya yi û digotî na Sitê na, ew na jî insan in û insanên rind û baş in. Qe metirse, ewna ji keçika me hez dikin.*

*Lê ew Rumana rokê bi yekva wenda bûne. Dûra dê û bavî min ji me ra qalkirin ku cenderme hatine û wana gîştik berhevkirine û birine derekê kuştine.*

Dîsa yek ji wan kesena ku 1911 da ji diya xwe bûyi û wêngê mala bavî xwe li Heymanê bûye jî Lawxalê dîyê min, Mehe Yîwiş bû. Ew di 1922 an da, 11 salî ye û li Heymanê çûye mekteba serete (*İlkokul*). Bave wî Yîwişe Hecî Ehmet jî li wir Müstantik yardımcı (*Sorgu Hakimî*) bû ye.

Wî yek bi yek qala Heymaneya wê wextê dikir. Li Heymanê Qaymeqam Ali Cemal Bardakçi, kale Rojnamewanî tirk Murat Bardakçi





Şex Said (Şex Said Elwanî, Şex Said Elwanî 1880-1951 Mikala Parîzi)

bûyî. (Wî di serhildana Şex Said da li Kurdistanê û di gelek komkujîyan da rolek meyn lîstîye), kî cirane wana bûne û kî esnaf û bazirgan bûne, gîştik qal dikir.

Heymanê wêngê li dû Enqerê navendek mezin a dudu ya bûye.

Wî qala Kôr İstefan dikir. Digot ew dewlemendê Heymanê bû. Dukana wî hebû. Dîsa qala Alexandris dikir. Û hîn qala çend Ermeniya dikir.

Wî digot; *Li dû qedandina herba Yunan, cenderme hatin û Gayrî Muslim (ermeni, rum û yahudi) gîşt berhev kirin. Kor Stefan dostê bavî min bû. Wî ji bavî min ra got; İbiş Efendî! Ben evimi ve dükkanimi sana teslim edeyim, eğer bir gün döner-*

*sem bana geri ödersin! (İbiş Efendi ez mal û milki xwe teslimi tekim, ku ez zivirim, tu ye wana dîsa bidî min.)*

*Bavê min nexast di bin wê mesulîyetê keve û ew qebûl nekir. Lê alîkariya Kôr Stefan kir, ew revand Stenbolê. Kôr Stefan ji wir jî revîya çû Yunanistanê. Cardin jî nehat Heymanê. Mal û milke wî jî ji tirkêkî ra ma. Gayrimuslimên din ên ku nikarîbûn birevîyana, ermeni, rum, yahudi gîştik berhevkerin û birin, li jêri Heymanê aşîkî avê hebû, di wir da dan ber qurşunga! Gî kuştin. Kôr Stefan heta sala 1951 a ji bavê min ra name dişand, dinivîsand. Lê li dû mirina bavê min elaqaye me ji hev vudu qetiya.*

Li ser qirkirina ermenîyan û gayrimuslima da tiştikî din ku min dîsa ji çend kesên din bihîstî bû, ji hêla Balayê ye.

Li Kêsike(Kesikköprü) begekî bi navî Meh Reş hebûye. Wî ji Kayserî Sarizê bi xwe ra du karkerên ermenî hanîne û wana di xizmeta wî da dişuxlîyane. Li dû şerê yunan komek cenderme gund bi gund digertîyane û li ku ermenî û rum hebûne digirtine û bi xwe ra dibirine.

Rokê wana hatine malîkana Meh Reş jî. Wana gotine; Axawo, me bihîst ku li cem te du ermeni kar dikin, ka tu yê wana teslimî mekî.

Meh Reş merivekî bi nifuz û camer bû. Bi berxedayî ku wana nede cenderma. Lê cenderma soz dane ku li wan xerawiyekî nekin û li du demekê wana dîsa bînin, bidin Meh Reş.

Meh Reş pir bi wana bawer nake jî, mecbur dimê û tenê ermenîyekî didê û î din wedişerîne, nade wana.

Cenderme bi wî ermenîyî va terin. Lê demek şûn va gundî laşî wî ermenîyî li ber gund dibînin. cenderma dest, ning, guhik û serê wî jêkirine, çav jê derxistine û li wir avêtine.

Li ser vê Meh Reş ermenîyi din bi dizika direvîne Stenbolê. Ew ermenî ji Stenbolê jî direve Amerîka yê.

Kesên ku ew mesele ji min ra qal

kirin jî torinên Meh Reş bûn û wexta ku qal dikirin, hîn di bin tesîra vê vahşetê da bûn.

Disa di kitêba H. İbrahim Uçak (ji eşîra Şexan e, jî gundî Şêxa Berbê–Emirler Eskiçalış e. Eslî xwe kurd e.) *Tarih İçinde Haymana*, rûpel 67da nivîskar wekîna qala nebaşiyên gayrimuslîmên navênda Enqerê dike; *Bir gün Samanpazarında işgal kuvvetlerine ait askerlerin kadınlara sarkıntılık ettiği, çocuklara tasalutta bulunduğu haberi şehre yayılmıştı. Bu acı haberi duyan halk galeyandan halindeydi. Nakşibendi Müderrislerinden Başılı Hoca adıyla maruf (Sadullah Seyhan) Ankaralı Hoca bu feci haberden heyecanlanarak 'Bu millet içinde, bir deynek başına mendil bağlayıp ta, ortaya çıkacak kimse yok mu?' diye haykırmıştı.*

*Bu haykırış, bu sesleniş, Ankaralının bağrında yüreğinde vatan ve hürriyet ateşini alevlendirecekti. Şehir delikanlıları, genç efeler kendi aralarında gizli bir teşkilat kurarak geceleri olayları çıkaran ekalliyet(Azınlık. Yazarın Notu: Burada hıristiyanlar kastediliyor) evlerine baskınlar vererek, hiç bir iz bırakmadan bıçağı ile kafasını gövdesinden ayırıyordu. Başlarında Aşağı Yüzün bıçkınlardan Ne gezenin Ahmet bu işi maharetle yapıyordu.*



Nivîskar H. İbrahim Uçak li vir gelek eşkere û zelal, bi avakî serbilind qala qirkirina gayrimuslima dike. Disa di rûpela 66-67 an da navên kesên ku ew tiştana kirine jî hene. Ewna endamê *Ankara Müdafayi Hukuk Cemiyeti* ne.

Ew komkujîya bi sistem li seranserî Anatoliyê hatiye meşandin. Wekî ku îro tê niqaş kirin, ne tenê li Kurdistanê, Ittihat Terakîperweran ew kar dane peş xwe ku gayrimuslima li Anatoliyê nehêlin, koka wana bînin.

Erê, rast e ku li Kurdistanê jî gelek kurd li hêla Serhedê, ji aliyê er-

menîyan ve hatine qirkirin. Ji ber ku li her gundê Anatoliyê kurdên ku di 1915 an de ji ber wan revîyane, hene û qala wê dikirin. Lê di vê bûyerê da ermenî û rumên ku eslî yê Anatoliyê bûn, welatê xwe wenda kirin.

Bila kurd vê baş bizanin, nika dor hatiye ser wana. Hineka ji me asîmîle dikin, dikin tirk, hîneka bi çeteyên xwe derdixînin dervayî welêt, hînek jî di nav şerê qilêr de dimirin!..

Em dikarin di dawiyê de biwêjin;  
**Du rûyên rastiye hene!**

# Em kurd tev mîna sêvên ji darekê ne !


KEMAL TOLAN

Berî ku ez têkevime nav babeta xwe, dibêjim xwezîka fersend û delîl di destên hinek dîroknas û lêkolînavanên me kurd(êzdî)an de hebûna û me jî karîbuna xwe bigihandina ser kûrayiya riknên şaristaniya mirovatiya Mezopotamiyayê. Hingê me yê bidîta û bizanîbûya bê ka netew û êzdiyatîya me çiqasî kevnare.

Ji bona em karibin ciyê hinek valleyên di kironolojiya dîroka koç û qerkirina me kurdan de hene dagrin û piçekî jî dîroka resenî, koç û qerkirina me kurd û êzdiyên xaldiyan agehdar bivin û xwe nasbikin, lazîme û hevî ji we hêjayan dikim ku hûn birênen li nêrîn û çavkaniyên di lêkolîna min ya bi navê **ÊZIDIYATÎ HAVEYNÊ MIROVATIYA MEZOPOTAMIYA** (<http://www.pen-kurd.org/kurdi/kemal-tolan/ezdiyati-haveyne-mirovatiya-mezopotamiya.html>) yê ye. Ev nayê wê mahnê ku min karîbû di vê gotara xwe de hemû pirsgirêkên dîroka koç û qerkirina me kurdan zelal

bidime xwanê. Lê, min nêrîna xwe ya ku dibêjim êzdiyatî haveynê mirovatiya Mezopotamiya yê ye û bi-taybetî jî xizna nasnama gelê kurd e û her weha nêrîna gelek ilimdar, dîroknas, nivîskar, rewşenbîr û rojnamevanên navdar, ku di lêkolîn û pirtûkên xwe de bi taybetî bahsa nav û dîroka êzdiyên xaldiyan kirine zelal dane xwanê.

Weke ku ez ji van ilimdar, dîroknas, nivîskar, rewşenbîr û rojnamevanên navdar fahm dikim, wan jî di nêrîna xwe de zelal dayê xwanê ku gotina miletê Xaltî anjî „Kaldî“, „xaldî“, „xalidî“, „xaldî“, „xalidî“, „xlarodî“, „khaldî-xaldî“, „xalid“ û whd., ji wexta dewleta hurriyan tê.



Û dewleta kurdên Hûrrî jî 4000 sal beriya zayîna Hazretî Îsa hebuye. Wexta Împaratoriya êzdiyên xaldiyan di Mezopotamiya yê de hilweşiya ye şunde, êdî êzdî(kurd) ketine bin bandora gelek împaratoriyên weke ya gutî, kasiyan, mî-taniyan, nehriyan, mûşkiyan, urar-tuyan, mannaiyan, mediyan, sassaniyan, bîzansiyan, birênen li naven ser van xerîtên jorê ku ji ber çavkanî (1) hatine girtin û whd.

Ji vê demê û pêde, êdî çiqas welat û zimanê me yekbin jî, gelek cûdatî û nezanî ne ligoriya daxwaziya me ketiye nava urf, adet, çande, ol û gelên li Kurdistanê hebûn. Her weha gelek valehî, nêrîn an jî agahdariyên ne rast li ser cîh-war û baweriyên li Kurdistanê hene û têne belavkirin.

Min li ser van valehî û neheqiyên di dîroka me de jî, di gelek lêkolînên xwe de bahsa xesar û zilma wan şerên ji bo serkeftina metîngehkarên, neheqî û zordariya di wexta destpêka ola zerdeştî, yahudî, xiristiyanî, musulmanetî û yên wekî dinê hatine li nava Kurdistanê bela bûne, her wusa bahsa zilma şah, xelîfe, sultan, paşa, mîr, beg, walî, axa, jendirme û berpirsiyarên hemu baylozخانên dewletên dagirker ku li kurdan û Êzdiyên ki-



rine, kiriye. Ev tev jî di gelek malper, rojname û kovarên me kurd û êzdiyên de ji bona agehdariya raya giştî hatine weşandin. Dema hûn hêjayan karibin li wan birênen û ji wan fêde bikin kêfa minê pir bê.

Weke min li jorê jî got, raste bi dehan nivîskar, rewşenbîr, dîrokanên xerîb û me kurdan jî li ser dagerkirina welatê me, belawbûn û asîmîlebûna miltê me nivîsandine.

Ji xwe ancax Xwedê tenê pê dizane, bê ka kengî dagîrker hatine ketine nava welatê me, bav-kalên me çend caran qir kirine, bi darê zorê ji hevûdinê qetandine, çend hezar kurdên ku bac û alîkarî nedane wan kuştine, mecbûrî koça kirine û ew birine li herêmên cude ku ji êl û êşîrên wan gelekî dûr de ji bona berjivendiyên xwe bicîh kirine.

Vêca, ezê vê carê jî biçime nava hinek zargotinên me ye dinê guhdarî bikim û birênim, bê ka çend

delîlên dîrokna û lêkolînanên dinê hene ku li ser kronolojiya dîroka koç û qerkirina me kurdan digîhîjine hevûdinê û ezê wan jî pêşkêşî we dost û hevalên hêja bikim.

Ez gelekî dil xweşim ku hinek nivîskar, rewşenbîr û dîrokzanên kurdên me ye Anadolîya Navîn jî li ser ol û koçberiya bav û kalên xwe di malpera <http://www.xelkedondurma.com> <http://www.birnebun.com>, <http://www.golyazibirligi.com> û hwd.ê de dinivîsin.

Weke ku ez ji zargotin û nêrîna hinek van nivîskar, rewşenbîr û dîrokzanên kurdên me ye Anadolîya Navîne jî fam dikim, ev rêzdar an jî weke nêrîna min didine xwanê û dibêjin, piraniya pêşiyên kurdên Anadolîya Navîn jî ji herêma mîrgeha mîletê xaldî anjî „kaldî“, „xalîkan“, „xaldî“, „xalidî“, „haldî“, „halidî“, „alarodî“, „khalidî-xaldî“, „xalid“, „xalta“, „xaldî (urartû)“ Serhedê, derdora Wan ê ([http://www.xelkedondurma.com/dirok/dirok\\_g\\_html/xalikan\\_bolge.html](http://www.xelkedondurma.com/dirok/dirok_g_html/xalikan_bolge.html)) û whd.ê hatine Anadolîyê û heta hinek jî ola bav-kalên xwe ye kevn eşkere dikin.

Ez niha dixwazim çend malik (paragraf)an ji wan nêrînên wane balkêş û weke gotinên wan e orgînal pêşkêşî we hêjayan bikim.

## Ev birayên hêja jî dibêjin:

1 – „Hinek rûspîyên me wiha dibêjin, ”Serokên eşîra ji hev heznedikir û hevdu biçûk didîtin, ji hev lome û gazin dikirin.“ Li odeyekê an li civatekê li ser tune ye şer dertêxistin ji hev bi dehan însan dukuştin. Elbet di vir da rola Îslamiyê jî pir bû. Eşîretên Anadolîyê bi piranî ji mezheba henefî (sûnî bûn) Nedixwastin ku digel mezhebê din bijîn. Îro em dibînin şêxbizîni li aliyekî ne. Ew mezheba şahfî ne. Dimilî li aliyekî ne şahfî û henefî ne. Têkiliyên xwe bi hev re pir tunen. Di nava civata kurdên Anadolîyê de kurdên êzidî û elewî jî gelek hebûne. Lê wan ji tirsan re dengê xwe dernetêxistine. Giran û giran ew jî derbasî aliyê Sûniya dibûn.

Hetanî salên 1950–60 an de hê şopa êzîdiya li ser kurdên Anadolîyê hebû. Sîng singo dilistin, agirên mezin vêtêxistin û di dor wî agirî re govend dikşandin û kilam distiran. Digotin, ”avê li êgir neke, ocaxî te kur bibe.” Berî xwe berve roj an hîvê didan û dua dikirin. Gava ku jina porê xwe şê dikirin, porê wan î ku diweşî vedişartin û digotin ”guneye!” Gava ku me xaniyên xwe dixelandin ji nav bi çalan porê jina derdiket.

Kalê min digot, ”Ew çî ye lo hûn

wek êzîdiya serhîşk in!” Min carekê ji wî pirsî; ”Kalo çima êzîdî ewqes ser hişik bûne?” Kurê min, me dîn/ola Mihemed qabul kir. Lê wan qabul nekirin, li ser dîn/ola xwe man.’ Mînakên wiha gelek in.

Qadrî Cemil Paşa jî ji bona Gawestiya wiha dibêje, di kovara Hawarê da. „Berî sed salî piraniya kurmanca koçber bûn. Havînê xwe li çiyayên Kurdistanê yên heft-reng dema xwe di nav gul û gulîlkan da derbasdikirin. Pêz û dewarên xwe diçerandin. Zivistanê jî berê xwe didan çiyên dine germ. Ji fêrat heta Diclê li vê deştê hana fireh çî çî koçer dihatin. Di vê çûyin hatina koçemalî da gayên zexm û xurt û hûr mûrên malên wan hildigirtin. Yekcaran çend malan ji ber qelsbûna gayên xwe nedikaribûn tevî hêla xwe bimeşin. Ji wan vediqetin, di cîkî têr av û giya da çend rojên xwe dibihar-tin. Paşê diçûn digehştin heval û hogirên xwe. Qebîla Seyitxan jî yek ji wan e bû. Mînak hinek jî çiya dadik-evin li deşta Dêrîkê dimînin /manê. Yên ku li dora Dêrîkê manê qebîla Rûta ye. Bi Xerecanan ve pismamê hev in.“ – Berdewama vê gotara balkêş û hêja gelekî weke vê girîng jî di çavkanî (2) an de ye .

2 – „Gerokê bi nav û deng MOT-KÎ wiha dibêje di bîraninê xwe de,

”kurd her tim cîranê Ereb û Farisan bûn. Ji bo ku wan ji ser axa xwe bi-ajon salê sê çar cara êrîş dibirin ser Kurda. Konên wan dişewtandin û li ber deriyê wan çî hebû ew dibirin ji xwe re. Ji kurdan re çiyekî bi tenê ma bû. Ew jî çiya bûn. Stara xwe di-kirin çiya.“

Em kurdên ku li derdorên Ankerê, Qonyê bicîh bûne ji **12a eşîreta** hatine avakirin. Li gor hinek rûspîya bavê wan eşîretan yek bûne, diyê wan cuda bûne. Yanî dibêje serokê Reşû ya bi danzdeh jin-an re zewiciye. Ji her jinekê kurekî wî bûye. Ew her yek bûyê serokê eşiretekê. Îro çiqas kurd li derdora Qonyê, Anqerê û Qirşehrê hene hemû hevdû nasdikin û ji hev keçik birine û lawik zewicandine.

Ew hemû xism û eqrebayê hev in.

- 1– **Sevkî,**
- 2– **Bilkî,**
- 3– **Mîfkî,**
- 4– **Xelkî.**
- 5–**Omerî,**
- 6– **Celkî,**
- 7–**Cudkî,**
- 8–**Terkî,**
- 9– **Nasirî,**
- 10– **Mamitî,**
- 11– **Şêxikî,**
- 12– **Sawedî.**

“ – Berdewama vê gotara balkêş û hêja gelekî weke vê girîng jî di çavkanî (3) an de ye .

